

Agahî di derbarê heqê karê ji kesên ku bidil alîkariya kulekvanan diken diegel qanûna §§ 1835, 1835a BGB

Alîkarîya bi dil ji bo kulekvanan bi giştî bê pere ye. Wekî Kulekvan (Alîkar) dibekû mesrefên we çêbin, we demê ev mesrefên we tên şûnvadan.

1. Şûnvadana bi giştî diegel kanûn § 1835a BGB

Şûnvadana digel kanûna § 1835a BGB salane 399,00 € ye. Ji bo şundagirtina mesrefên we ji maqbuza dadgeha malbatê lazim nîne.

Şundadayîna mesrefan salê carek tê bi cîh anîn. Ji girtina mesrefan dibê hûn hetan 31.03. sala din serî lêdana fermî bikin. Ger hûn nekin ew maf radibe.

Minak:

Sala karê Hêjadarî ya we hetan 15.08.2009. Serîlêdana şundagirtina mesrefên we hetan 31.03.2010.

Serîlêdana girtina vê Formularê (Kaxizên serîlêdanê) digel pirsayerek be form hûn dikarin bikin.

2. Bedelê Lêçûnan (Mesrefan) digel § 1835 BGB

Ger lêçûnên we ji 399,00 € derbasbikin, dibê kû hûn ispat bikin ji bo çî (Roja zîyaretê, mesrefên rê, perê telefonê, perê nameyên hatine şandin.). Ji bo çûna bi erebeya şexsî 0,30 € ji bo her kilometreyek tê dayîn.

Ji bo şundagirtina Lêçûnên we, dibê hûn navbera 15 mehan de serî li dadgeha malbatî an jî dadgeha kulekvanîyê bixin.

3. Mafê hilbijarê

Serîlêdan tenê bi giştî û li gel ispatkirana meqbuzan tê bi cîh. Ji bo vîya rîyek baş ji bo xwe hilbijêrin. **Hilbijirandin nayê guherîn.**

4. Dozajotina şundagirtinê

Heger kesê elaqedar feqîr be û perên wî tune bin, anku dahatên wî di bin astê alîkariya civakî ya dewletê re bin (Sozialhilfesatz) û her wekî din jî heger tu milk û malê wî nebe û perên wî yê taybet î parastî nebin (Schonvermögen) wî çaxî ew dikare daxwaynameyekê pêşkêş bike û xezîna eyaletê dikare xwe bide ber mesrefa wî

Bilindiya perên taybet î parastî, ku dewlet nikare dest bidiyê (Schonvermögen) 5.000 € ne.

Heger dahata kesê elaqedar baş be yan heger milk û malê wî hebe, wî çaxî tu dikarî mesrefa xwe bi belge (li xala 2ê vegere) bêy daxwaznameyê nivîskî piştî ku mesref çêbû, yekser mesrefa xwe ji kesê elaqedar bistîn. Heger te bedelê giştî yê mesrefê (pauschale Aufwandsentschädigung) hilbijartibe (li xala 1ê vegere), tu dikarî vê mesrefa xwe piştî derbasbûna sala xwedîkirinê ji milkê kesê elaqedar bibî. Kontrolkirin hêdî dê piştra di çarçoveya pêşkêşkirin û radestkirina belgeyên mesrefê û raportê de were encamdan.

5. Wezîfeya Pacê

Ji bo şundagirtina mesrefên we hûn ne mecbûrin pacê (vergîyê) nîşan bidin. Paca xwe hûn dibê bidin eşkerekirin ger hûn ji şeş alîkariya kulekvanîyê zedetir karek bicîh binin. Ev yek ji Servet û varyeta we ya wek mînak ji karên we yê esasî jî derbas dibe. Ji bo agahîyên berfireh, kerema xwe serî li daîreya pacê bixin.